M. S. LAZAREV

PIRSA KURDAN (1891-1917)

Weşanên Roja Nû

dın ne dıbûn. Xweseriti û malwêraniyên, ku dı sedsala XIXa û destpêka sedsala XX-i lı Kurdıstanê, Ermenistana Roava û Azırbècana İranê da dıbûn, sebebên wan ne tenê yên abori bûn, herwaha daxazên zordestên hundur û der bûn.

Dı sedsala XIXa û destpêka sedsala XX-i kaniya dewlemendbûna derebegên kurd - zêrandına bıneciyên rıat yên xwelibêcerkır bû û pıraniya wan ji ermeni bûn. Pırsa agrariyê lı Kurdıstanê û Ermenistana Roava wi çaxi jı pırsa mıletiyê ne dıhate bırinê, jı ber ku zêrandına cıvaki û gelêri bı hev ra dıhate kırınê.

Derebegên kurda bı bêwêjdani gundiyên ermeni dızêrandın (60). Lı Kurdıstana Tırkiyê û Ermenistana Roava cûrê cezakırınên sedsalên navin dıhatıne bıkaraninê. "Qeza Sasûnê da,- cigırê konsûliê Rûsiyayê lı Wanê Tûmanski dı destpêka sedsala XX-i nıvisiye,- ermeni qûlê (dil) kurda ne, her ermenik dane kurdeki û ew bûye qûlê wi, kurd gava hewcê pera bın, wana dıfroşın; gava kurdek lêde qûleki yeki mayin bıkuje, xwediyê wi dıkare dewsê qûleki wi bıkuje". Hınek bega dı gundên ermeniya da "mafê şeva pêşın" (61) (şuhurandına keça.- N. W.) kıvş kırıne. Ermeniyên wi awayi ra dıgotın "zir-xurli", ango, bı zêra kıri. Linç derheqa vê yekê da awa dınıvise: "Ew (ermeni.- M. L.) jı aliyê axa û begên kurda da usa têne kırinê û fırotanê, ku tê bêji qey pez û dewar ın". Kırin-fırotana gundiya tevi xweliya ku ew lı ser dıman û dıxebıtin dıhate kırınê (62).

Navê "kafırizmê" (jı gotına erebi "kyafûr" e - ne amın, bê xwedê,- ev nav lı wan meriyan dıkırın, ku ne musulman bûn) lı van peywendiyên dilên ermeniya û beg û axayên kurda kırın. Kafırizm,- Bêkgûlyans, ku rınd haj jı qewlên deba bıneciyên Wanê hebû, beri şerê hemcıhanê yê pêşın nıvisiye,- ango "xweseriti û zordari, bêqanûni û neheqiyên begên kurda...". Danûsıtendınên dı navbera ermeniya û şêxên kurda da,- Bêkgûlyans dınıvise,- danûsıtendınên mirlaw û xweşmêrên derebeg yên sedsalên navin berbı wan gundiya tinıne bira meriya, ku lı ser xweliya bın destê wan da dıman" (63).

Her gundek,- wê şûnda Bêkgûlyans dıde kıvşê,- bın qolê begê xwe da bû û gerekê xerc-xerac bıdayê. Her malek mecbûr bû dı rojên kıvşkıri da bê heq jı bo beg bıxebıtiya, yê ku dıkarıbû herwaha xercê pereti ji bavêje ser bıneciya û jı wi baci ra kyafır dıhate gotın (64).

Kafırizm pırtır lı navçeyên Sasûnê, Mûşê, Hizanê, Moksê û ciyên mayin da bela bûbû. Axa û begên kurd rênta hasıletê (hetani nivê ekın) û pere ji jı gundiyan dıstendın. "Malhebûna nivkoçera û koçe-

56. V. Cu...
57. G. E Hubbard. ...
...potamia and Kurdistan in Disguise, London, rûpel 395. Hejaye em bır-bawe-
rya braziyê Ebdul Hemidê II - Sabaheddin yên derheqa kurda da binın, yê ku dı
dema şoreşa cantırka da karmendeki siyasi yê bı nav û deng bû û wê demê der-
dekete dıji sultan bı xwe. Dı gotara wi da, ku dı rojnama ”Maten” da hatiye çap-
kırınê, ewi nıvisiye: ”Kurd geleki zirek û jêhati ne. Sertti û berktiya wan jı jiyana
wan ya cıvaki tê. Eger ew bı xweliyê va bıhata gırêdanê, ewê jı şer û dewa dûr
bıya û wê ew erdê Asiya Bıçûk ya rêj û dewlemend şên bıkıra” (ev gotın jı ”Tif-
liskiy listok”ê hatiye hıldan, 8. 11. 1906).

58. ”Nıvisên derheqa rewşa siyasi lı Kurdıstana Başûr û Mesopotamia Ba-
kur da”,- MBEOK, 1904, hejmar 1-2, rûpel 51.

59. Gori K. A. Çaçanyan (Karlenê Çaçani), *Dostaniya gelên ermeni û kurd dı sedsalên XIX-XXa da*. Aftoreferata disertasiyonê bona doktora ulmên dirokê. Yerevan, 1965, rûpel 10.

60. A. S. Hambaryan ser wê baweriyê ye, ku ”axa û begên kurda hema bê-je dı hemû wılayetên Ermenistana Roava da pırani bûn”. Tenê dı senceqa Xarpêtê da tırk pırani bûn, lê hınek ciya ji aşûri pır bûn. Xwelibêcerkırên ermeni tenê lı hınek ciyên wılayetên Wanê, Xarpêtê û Diyarbekırê pırani bûn; wana dı jiyana welêt ya abori û siyasi da tu rolek ne dılistın. Begên kurda lı ser erdê xwe ... Ber destê wan da bı seda û hezara xulam hebûn (A. S. Hambaryan, *peywendiyên agrariyê dı Ermenistana Roava da*, rûpel 15-16).

61. ASDR, fond ”Politarşiv”, 1901, dokument 711, liste 36, 45, 4-ê gulanê ...

62. H. F. B. Linç, *Ermenistan, Qıse û serpehatiyen ...*, ... rûpel 554.

Dirokzanê ermeni Leo nıvisiye: ”...20-30 sala pıştı tanzimata lı Eremnistana Tırkiyê, kırivti dı nav kurda da gelek dera bela bûbû (Xizan, Bonaşên, Sasûn, Wan, Palû û yên mayin”. Leo gotınên metran Grigoriy Axvanyan tine, yê ku nıvisiye, ku begên kurda ”gelek cara kırivên xwe yên ermeni bı jın û zarokên wan û mal û mılkên wan va an bı hev ra dıguhartın, an ji dıfrotıne hevdu (gori H. M. Harûtyûnyan, *Siyaseta reaksiyon ya bûrjûwaziya Ingılis dı pırsa ermeniya da dı salên 90-i yên sedsala XIXa*. Aftoreferata disertasiyonê bona doktora ulmên dirokê, M., 1954, rûpel 96, 97).

63. R. Bêkgûlyans (Severyanin), *Lı Ermenistana Tırkiyê*, rûpel 74.

64. Disa lı wır, rûpel 74-75. Lı Botanê, rêwiyê alman Myuller-Simonne nıvisiye, axayên ci jı gundiyên ermeni ewqas bac dıstendın, ku ew mecbûr dıbûn xw... ya revê bıgrın (P. Müller-Simonis, *Vom Kaukasus zum Persischen Meer durch Armenien, Kurdistan und Mesopotamien*, rûpel 237).
... A. S. Hambaryan, *peywendiyên agrariyê dı Ermenistana Roava da*, rû-